"TKP'nin Sesi" 24. Nisan 1983 Pazar

D.D. Bu yayınımızda şunları dinliyeceksiniz:

1. TKP MK'nin 22 Nisan günlü bildirisini Spk: Öm.

2. TKP MK'nin Eylem Programının son bölümünü Spk: Öm.

3. Kürtçe programımızı (Şerf.) Spk: Şerf.

---

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

24-4-1983 Şerif

TKP'nin Sesi

MK'nın Deniz Yoldaş'ın ölümü üzerine çağrısı

KOMUNİSTNO,KARKERNO,HEMU GELÊ ME.

Endamê Navça Komita PKT Mistefa Hayrullahoxlî,Hevrê Denîz di hîva Sermavêzê,li Stenbolê bi destê polêsên sîyasî ya cuntayê bi rênc û teda kirinê hate Kurştin.Ev mêrkûştina Polîtîk ya cuntayê di hîva Avdarê hate hinbûyîn.Celladên wî,ewî dizîkava li Kasimpaşayê goristana bêkesanda çehlkirin.Lê bi rastî ew li singa Partê me,singê çîna meyê Karker û li hundurê gelê meda radizê.Navê wî di dila şerkarên ji nîren emperyalîzmê û ji hemû cûre mêtin û zordestîyê rizgarbûyînê da dişevite,wê bişevite.

Hevrê Denîz sala 1948'an li Dîyarbekir bû.Xwendina xweye bilind di Fakulta İktisata Universîta Stenbolê qedand.Ew di salên

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

xweye cîvanîyê tevbû tevgera xwendevanan ku li ~~salên~~ bi salên 60'an hemberê emperyalîzma Emerîqa û hemberê NATO bilindbibû.Hundurê ~~Fikir Kulüpleri~~ ~~Federasyon'ê û Devrimci Doğu Kültür Ocakları xebiti.~~ FKF, Federasyona Kulübên Raman^û hundurê/ DDKO Kuçikên Çandeyê Rojhilat Şoreşger xebitî. Dîsa hundurê vî salan xwe girêda tevgera çîna karker ku geşdibe.Bû endamê TİP'ê.Sala 1969'an tevbû berxwedayîna karkerên Sungurlar û, gelek berxwedayînên karkeran.Di sala 1970 di honandina meşîna karkeran,ya 15-16 Pûşperê,di weşandina rajnameyek kardistan bi navê Tekel Gerçek bi libatî vatînî anî cî.

Bi hetreka leşkerî ya 12 Avder sala 1971 weka gelekan ew jî cerîbandinên xweye evil ya xebatên îllegal pêkanî.Bona gelek şoreşker ji terora 12 Avdarê biparêze vatinîyên bê hempa anî cî.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Li sala 1975'an Hevrê Denîz tevbû qorên PKT.Hundurê komêlên Partê Stenbolên,li gelek cîyan xebitî.

Davîya wergerandina leşkerîya 12 Kewçerîna paşwerû hemberê êrîşên gûr ya paşwerûtî, tekoşîna hemberê fraksîyonkarî vatinîyên giran hilda ser xwe.

Partê me,xebatên wîye mirandvanî li qorên partê,babetîyên Komunîstî ya bilindhilda ber çewan,û ewî jibarte endamê Navça Komîtayê. Ew bi hemû tekoşîna xwe va bi delîl kir,vatinîya hane bi berpirsîyarî heqkiribû.Hemû vatinîyên partê me da bû ser milê wî,heyya mir bi jêhatîbûn û bi mirandvarîyek mezin,bi werînî anî cî.

Hevrê Denîz bi hemû tiştên xwe xwe kiribû gorîna partê,Komunîstek wekok bû.Pêwendîyên germ û mirovkî ku ew bi hevrêyên xwe damezi-

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

randibû,ji dilên nazkirîyên wî wê dernekeve.Ew,hundurê tentêla herî dijwar da jî,ji wêna xweye pola qe tiştek indanekir û tekoşin domand.
cindî,ya
ji vî pêşta jî ewê bibe Nîşana/girêbûyîna Marksîzm-Lenînîzm û enter-
nazma
nasyonalê Proletaryayê,bona partê,bona doza Komunîzmê canê xwe ne-hevişandinê ,dilnizmîya hevrêtîyê,hemberê neyarê çînî û hemberê polêzê biqudûma zanîyarî li hundurê meda wê bijî.

Neyarên gelê me,cuntaya paşwerû û polêz qey gotin bi girtina wî keysek giring derbasê destê xwe kirine.Ew hêvîkirin heyya vê dem mê ~~pêkn[illegible]~~ hemberê êrîş û girtinên bê davî pêkneanîne belabikin, vê komelên Partê Stenbolê biqelînine.Lê hevrêyêmeye mêrxwes fêla han xirabkir.Ew bona parêztina komelên meyên Partê ku bona bihêzkirina van mirandvanîyên bêhejmar pêkanîbû canê xwe da.Serê xwe da lê raz

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

neda.Destur neda anora wîye komunîst were qirêckirin.Hevrê Denîz ça-
jîyîna xwe da pêkanî,waxtê canê xwe indakir jî partê me bi hêz kir.
Yekîtîya Partê Lenînîst,morala komunîstî ku burcûwazîya karbidest,po-
lêz û neyarên PKT'yê sondxwerî hemû cûre dixebitin bihirşînin,ew hê
jî bilindkir.Vêga hema hevrêyek bikeve destê polês,ji xweda hêza
berxwedayînê bilindtir wê bibînin.Ew beramberê van,pêşîya kesên dix-
wezin komunîstên tekoşîndidin ji partê wî biqetînin,dixebitin bawerî-
yên bîrbirîna komunîzm qelsbikin dibe mertalek bi hêz.Ew bawerîyên
serfirazîyê ya ji mirinê netirsî şerdikin hê jî tûjdike.

PKT dixweze berpirsîyarên kûştina Hevrê Denîz rêbirên MİT'ê,
rênckirên,pirskiran,alîkarên wan û yên mirina wê weşartine bila we-
rine eşkerekirin.Yên ku mêrkûştina hane sîyasî pêkanîne û hemû hev-

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

karên vî sosretê gere sîzên heqkirine bibînin.PKT pêsîra bisosretan wê bernede.

NK PKT ~~gazîdike~~ hemû nêzîkên Hevrê Denîz û hemû nêzîkên welatparêzên bi destê cuntayê hatîne qetlkirin,û hemû hêzên welatparêz gazîdike alîkarîya xwe bihêzbikin,hemberê rênc û tedayê,hemberê mêrkuştinên polîtîk,hemberê dardakirinan livînên protestoyê bilindbikin.

NK PKT,hemû hevrêyan bona bîranîna wî hemberê hemû cure êrîşên cuntaya paşwerû,polêzê û provakatoran gazîdike seferberîya parêztina Partê,û xebatên Partê ji hemû alîvanva bihêzkirinê.PKT hemû cîvana pêşwerû di rêya layîqê wî bûyînê da tekoşînkirinê ,dora Partê û dora polîtîka wîya Lenînîst,di rêya çîna karker gazîdike pihêt hevgirtinê.

PKT,bi vî şerkarê xweye mêrxwes her tim wê bi anor bibîhîse.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Heyya vî demê gelek komunîst Ala sorîn dane destê hev, Hevrê Denîz
(Ala sorîn ku)

~~xxî~~ nehîşt (ala sorîn) bikeve erdê, PKT ~~ala sorîn~~ (wê) hê jî ~~wê~~ bilindbike.

Cotan 1983

Navça Komîta

Partê Komunîst Tirkîya

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI